

Agahdarî li ser Qarantîna

Hûn li ser Gesundheitsamt Reinickendorf wusa dikarin bigihîjin me:

Telefon: 030 902 94 55 00

Demên vekirî: Dûşem heya yekşem, 09:00 heya 15:00 Uhr

Înternet: <https://www.berlin.de/ba-reinickendorf/corona>

Sazîya tenduristîyê we şandîye Qarantîna, ji ber ku hûn

- bi COVID-19 nexweş ketine an jî
- têkilîya nêzîk bi nexweşekî COVID-19 pêk hatîye
- şubhe heye ku hûn bi COVID-19 nexweş ketine.

Divê hûn ve fermanê bi teqez bînin bi cîh.

Tenê bi vî awayî hûn kesên din tûş nakin.

Qarantîna bi ferman zagon e.

Fermana qarantîna ji were bi nivîs jî wê ji alîyê sazîya tenduristîyê wê were şandin.

Rêzikên qarantîna pêk bînin!

Divê hun ji mala xwe dernekevin.

Ku hûn bi zêde kesan re di malekê jîyan dikin,

divê hûn xwe di xurfekê de îzole bikin.

Hatina mêvanan jî qedexe ye.

Ji heval u naskirîyên xwe rica bikin ku ji bona we danûstandinê bikin.

An jî danûstandinê li ser rîya firmeyên belavker bikin.

Ger hûn alîkarî nikaribin ji kesên din bistînin,

hûn dikarin li sazîya tenduristîyê bi telefon bigerin.

Nîşanên nexweşîyê bi we re hene?

Ger bi we re wek kesekî têkilîyê, nîşanên nexweşîyê hebin,

hûn dikarin ji sazîya tenduristîyê ji bona testa-korona serî lêdin.

Nîşanên nexweşîyê bi mînak Agir, kuxik, an jî zekem in.

Li Sazîya Tenduristîyê Reinickendorf bi telefon di bin hejmara 030 902

94 55 00 bigerin. Ji bona testa-korona hevdîtinek çêkin,

ji ber ku bê hevdîtin hûn nayên test kirin.

Ger hûn ne kesekî têkilîyê bin,

lê nîşanên nexweşîyê bi we re hebin,

hûn dîsa jî alîye sazîya tenduristîyê nayên test kirin.

Ger hûn bixwazin testa-korona çê bikin,

ji Doktorê xwe an jî ji Doktora xwe yê malê pirs bikin

Destûr heye ku hûn qarantîna nîv rê bihêlin?

Kêm destûr tèn dayîn di vê mijarê de,
ku qarantîna were qut kirin.

Sedemên destûrdayîn bi mînak

- şewat di mala we de,
- xeterîya li ser tenduristîyê wek,
felcê, şok an jî dilrawestan

- definkirina xwedîyan an jî hevalên nêzîk,
- Çûna rêya qorona (peya, bi biskilêt an jî trampêl)

Ger hûn ji mala xwe di rewşa taybet de derkevin,
mesafe bihêlin u bi maske bin.

Ji kesan re bêjin ku hûn bi COVID-19 nexweş ketine
an jî şubhe heye ku hûn nexweş bin.

Ger hûn bixwazin biçin defnê an jî
ji mirovekî ku di ber mirinê de ye xatir bixwazin,
divê Sazîya Tenduristîyê destûr bide we.

Destûrên taybet ji bona kesên ku li nexweşxanan jî
kar dikin, dikare were dayin
an jî di kargehek din ya girîng. Wek din ku ji kargehê re gelek girîng bin.
Ji bona destûra taybet divê Karker an jî xwedîyê kargehê serî lêdan li
cem sazîya tenduristîyê bikin.

Ku hûn têkevin qarantîna, kî mehanîye we dide?

Hûn ê mehanîyên xwe bi dewamî ji Kargeha xwe bistînin.

Kargeha we dikare ji bona alîkarîya aborî li cem Senatsverwaltung für
Finanzen serî lê bide.

Kû hûn jî xwedî kargeh bin,
divê hun serîlêdan bi xwe bidin.

Zanyarîyên din hûn dikarin di înternetê de bibînin:

<https://www.berlin.de/sen/finanzen/service/entschaedigung/>

Kîjan alîkarîyên din hûn dikarin bistînin?

Hûn di qarantîna de ne.

Ev mijareke taybet e,

ku di rewşên xeterî de jî divê were pêk anîn!

Rewşa xeterî: Birîndarbûn, jahrbûn, qeda

Bi mînak, ku hûn bi giranî birîndar bun,

wê demê telefona Notruf 112 lê bidin.

Ji wan re bêjin bê çî qewimî û

wan agahdar bikin ku hûn di qarantîna de ne.

Nexweşîyên din u derman

Ger ku hûn di dema qarantîna de nexweş bin,

li doktorê xwe an jî doktora xwe yen male bigerin.

Ji wan re bêjin bê ji we re çî lazim e

u ku hûn di bin qarantîna de ne.

Ku hûn nikaribin bigihîjin tu kesî,

telefon 116 117 lê bidin.

Zarokên di qarantîna de

Ger ku zaroka we neçar têkeve qarantîna,

ew rewş ji bona hemîyan bi zehmetî ve girêdayî ye.

Ger ji wer e alîkarî pêwîst be,

li sazîya tenduristîye bigerin.

Ku zaroka we bi emrê xwe di bin 12 salan de be

Hûn dikarin li mal bimînin.

Belgeya fermana doktor ji bona qarantîna ya zoroka we,

Ji bona kargeha we bes e.

Giranîyên ruhî

Qarantîna rewşek taybet e,

ku tê de tirs, derd u tenê mayîn derkevin holê.

An jî pirsgirêk di nivistinê de u depresîonan.

Bi heval u naskirîyan re her dem bi telefon hevdiîtinan bikin

an jî li ser rîya înternetê de di têkilîye de bimînin.

bi mînak telefona-vîdeo bi kar bînin.

Di mala xwe de spor bikin,

bi mînak jîmnastîk an jî sîpora qewetê

Ku ji wer e alîkarî pêwîst be,

li Kriesendienst bigerin.

Alîkarîyên din

Alîkarîya pîskolojîk

- **Berliner Krisendienst**
Dûşem heya Yekşem ji seet 16 heya 24
Telefon 030 390 63 - 0
- **Corona-Hotline des Berufsverbandes Deutscher Psycholog*innen** Dûşem heya În ji 8 heya 20 Uhr
Telefon 0800 777 22 44
- **Telefonseelsorge für Erwachsene**
24 seet vekirî
Telefon 0800 111 01 11
- **Silbernetz, Telefonseelsorge ji bona kesên pîr u tenê**
Dûşem heya Yekşem ji seet 8 bis 22
Telefon 0800 470 80 90

Gewalt-Schutz ji bona kesên gihîjtî

- **BIG Hotline di zordestîyen di malan de**
Dûşem heya Yekşem ji seet 8 heya 23
Telefon 030 611 03 00
- **LARA – şubheya taybet ya zordestîya cinsî**
Dûşem heya Yekşem ji seet 9 heya 18
Telefon 030 216 88 88
- **Gewaltschutzambulanz**
Dûşem heya În ji seet 8:30 heya 15
Telefon 030 450 570 270

Ji bona zarok u malbatan

- **Kinderschutz-Hotline** di şubheya zordarî li ser zarokan, îhmala wan u destdirêjîya cinsî li ser wan
24 seet vekirî
Telefon 030 61 00 66
- **Kinder- und Jugend-Sorgentelefon, Hejmar dijî keder**
Dûşem heya Şemî ji seet 14 heya 20
Telefon 116 111
- **Kindernotdienst Berlin ji bona zarokan u dê u bavên wan**
24 seet vekirî
Telefon 030 61 00 61
- **Jugendnotdienst Berlin ji bona ciwanan u dayik u bavên wan**
24 seet vekirî
Telefon 030 61 00 62